

KT

**Zanîngeha Mêrdîn Artuklu yê
Enstîtuya Zimanen Zindî yên Li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî
Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

**RENGVEDANA DÎROKA NÊZÎK DI STRANÊN
MIRADÊ KINÊ DE**

ŞEYHMUS ÇETÎN

15721089

Şewirmend

Alk.Doç.Dr: Necat KESKÎN

Mêrdîn 2016

NAVEROK

NAVEROK.....	1
KURTE.....	2
ÖZET.....	3
BEŞA YEKEM: ARMANC Ê SÎNORÊN XEBATÊ.....	4
1.1. Mijar û Armanca Xebatê.....	4
1.2. Sînorên Xebatê.....	4
BEŞA DUYEMÎN: ÇANDA DEVKÎ, VEGUHASTIN Ê HAFIZEYA CIVAKÎ.....	5
2.1. Veguhezêrên Çanda Devkî û Hafizeya Civakî.....	5
2.2. Di Nav Kurdan de Veguhezêrên Çanda Devkî û Hafizeya Civakî.....	7
2.2.1.	
Dengbêjî.....	8
2.2.2. Mitirbî.....	8
2.2.2.1. Ribab (Kemançe).....	9
BEŞA SEYÊMÎN: RENGVEDANA DÎROKA NÊZÎK Ê HAFIZEYA CIVAKÎ DI STRANÊN MIRADÊ KINÊ DE.....	10
3.1. Jiyana Miradê Kinê.....	10
3.2. Rengvedana Dîrokî Di Stranên Miradê Kinê De.....	11
3.2.1. Seîdo Axa.....	13
3.2.2. Elîkê Betê û Şoreşa li Tur Abîdînê.....	15
3.2.3. Bişarê Çeto û Serhildana Heremê.....	18
BEŞA ÇAREMÎN: ENCAM.....	24
ÇAVKANÎ.....	25

KURTE

Çanda devkî, dîroka nêzîk û hafîzeyaya civakî bi hev re di têkiliyê de. Buyerên ku di paşerojê de qewîmîne û ji bo civakê girîng in bi awayekî di nav çanda devkî de bi riya veguhezêrên çanda devkî gihîştine heta îro.

Çanda kurdan jî ji vî alî ve gelekî dewlemend e. Ji ber ku nivîs zêde ne berbelav bû, hafîzeyaya civakê bi riya vegotinên veguhezêran çanda devkî ji nifşekê bo nifşên din hatiye veguhastin. Stranên dengbêj û mitirban jî di heman çarçovê de dikare were nirxandin.

Li herêma Tur-Abdîn (Torê) mitirban ev rol hilgirtiye û buyerên ku di dîrokê de qewîmîne bi stranên xwe di bîra civakê bicîh kirine.

Miradê Kinê yek ji wan kesan e ku herêma bin av û deng e. Stranên wî her weha rengvedana dîrokê ne.

Di vê xebatê de me hewl da ku em di nav stranên ku ji hêla Miradê Kinê ve hatine gotin de buyerên dîroka nêzîk ya herêma bişopînin. Ji bo vê yekê me sê mînak ji Miradê Kinê girtin. Ji aliyên din ve bi hevpeyvînan jî me xwest tiştên di stranên de piştras bikin.

Wek encam, hat dîtin ku stranên me wek mînak girtine di heman deme de rengvedana buyerên rasteqîn ên di dîroka nêzîk de qewimîne ne û bi riya kevneşopîya devkî di hafîzeyaya civakê de cih girtine.

ÖZET

Sözlü kültür, yakın tarih ve toplumsal hafıza birbiriyle ilişki içindedirler. Geçmişte yaşanan ve toplum için önemli olan olaylar sözlü kültür ortamında, sözlü kültür aktarıcıları tarafından günümüze kadar ulaşmaktadır.

Kürt kültürü de bu açıdan çok zengindir. Yazı çok fazla yaygın olmadığından toplumsal hafıza sözlü kültür aktarıcılarının anlatımlarıyla kuşaktan kuşağa aktarılmışlardır. Dengbêj ve mıtırbırların stranları da bu çerçevede değerlendirilebilir.

Tur-Abdin (Torê) bölgesinde mıtırbırlar bu rolü üstlenmişler ve geçmişte yaşanan olayları stranları ile toplumun hafızasına yerleştirmişler.

Miradê Kinê, bunlar arasında bölgede meşhur olan birisidir. Onun stranları aynı zamanda yakın tarihin yansımalarıdır.

Bu çalışmada Miradê Kinê tarafından söylenen stranlar içinde yakın tarihin olaylarının izini sürmeye çalıştık. Bu amaçla Miradê Kinê'nin stranlarından 3 örnek seçtik. Diğer yandan görüşmelerle bu stranlarda anlatılanları doğrulamaya çalıştık.

Sonuç olarak, örnek aldığımız stranların aynı zamanda yakın tarihte meydana gelmiş gerçek olayların yansımaları oldukları ve sözlü gelenek yoluyla toplumun hafızasında yer edindikleri görüldü.

BEŞA YEKEMÎN

ARMANÇ, SÎNORÊN XEBATÊ

1.1. Mijar û Armanca Xebatê

Rewşa gelan her tim bi pêş de diçê tu cari bi dawî de nameşê, bi vî awayî jî wexte ku nivîsandin tune bu û heta dema niha hêdî hêdî gel bi pêşde diçê. wextê ku em li paş dinerin u beri hezar salan di paşde diçin, mirov ji bona ku çanda xwe lîstik û stranen xwe bi awayekî devkî parastine û her çikas zahmet bê jî ev taybetî gihandine heta ciyekî ku em jî niha lê rast tîn.

Bi rastî stran ji bo çavkanîyan weke surekê ye. Ji bona ku mirov stranen behtir bi rehetî di hafiza xwe de dikarê bihêle û bi ve riye pîrik di çîroka de be, di hikaye ku ten gotin de be di nava van de bi awayekî dengbejtî tîn gotin û wiha jî tîn parastin.

Stranên Miradê Kinê jî ji ber ku di gelek civakên cur bi cur de tîn ser ziman û ji ciwanan heta bapiran çî mirov li wan dihisîne jê feyz dibîne û vê dewlemendiye di mejîye xwe de bi cî dike. Ev jî têkilîyeke di navbêra veguhezêrên çanda devkî û hafizeya civakî destnîşan dike.

Armanca vê tezê ev e ku di nav stranên gelerî yên Miradê Kinê de rengvedana dîroka nêzîk û bi vî awayî jî hafizeya civakî ya herêma Torê bi hinek mînakan ji stranê wî bidin nîşankirin.

1.2. Sînorên Xebatê

Wek ku li jor hate gotin, ev xebat bi hinek mînakên stranên Miradê Kinê û bi herêma Torê ve sînorkirî ye. Ev mînakê stranên ji çend kasetên Miradê Kinê hatine berhev kirin. Pêşî ev stran hatin deşîfre kirin û piştê jî yên têkildarî “dîroka nêzîk û hafizeya civakî” ji wan hatin derxistin. Ev buyerên ku di stranên de hatine bilêvkirin bi çavkaniyên din re jî hatine berawird kirin.

BEŞA DUYEMÎN

ÇANDA DEVKÎ, VEGUHASTIN Û HAFIZEYA CIVAKÎ

2.1. Veguhezeren Çanda Devkî û Hafizeya Civakî

Hafize ji bona bîrbirina buyêran gelekî girînge, ji ber ku hem di warê yekîtîyê de jî û him di ware bi serêxebunê jî li ber bandora kevneşopîyê nikarê zêde bisekinê lê karê pêre, di têkiliyêde bi riya xwe berdewamîyê dike Ong jî vê yekê wiha tîne ziman;

“Kevneşopî ji bo alîkarîya bîrbirinê re gelekî bandorê u ji mirova re bîngehekê zêde çedikê, her çikas em di nav dîrokê de diçin xafîza bi alîye biserexebunê ve diçe, wek mînak wexte go em bi ber heyamê antîk ve diçin behtir tenêbun çedibê û em çikasî bi alîye dîroka roja me ve tîn bi ser modernîzmê ve nêzîk dibin xafîzayên cûda cûda tîne pêşîya me wek şopa Freud psikanalîtîk wek a Proust xwejenîgarî wek a Bergson ya felsefî. whd.”(Ong 2013:56).

Çikasî em bi ber yekîtîya gelan ve ten, bandora hafîzê li ser çandê zêde dibê û ev taybetî heta roja îro hat û ji kevneşopîyê çu bi ber alîye çandî ve.

Bi rastî di ve şopandinê de tişteki balkêş derkete holê, wek mirovek wexta ku dibêjê ev buyer ji alîye jînenîgarîyamin ve tîn, em dibînin ku dîrokê bi mabestekê taybetî û serbixwe destnîşan dikê ev jî hafîza serbixwe derdixê pêş û ev taybetî jî di jiyana îro de buye wek cinsekî wejeyî wek hatira, û gelekî jî tê xwendin. Wexta ku em li wejeya îro dînerin ev şopa ku Augustines u Holbwach daniye bi hev re dimeşin u hafîza kolektîfî an jî a takekesî heta îro li ser gel bandora xwe berdewam dikê.

Ez karim mînakekê bi vê mijarê re bînim ser ziman Mele Abdul Gafurê Seyidê Berzencî ku wexta pirtukekê cegerxwîn çap bu di nava helbestekê de valayikek hebû Mele ku min ew kêmasî zanîbu, di go wexte ku ez xortekî pazdeh salî bum em çubun gûndekî û ev helbest bi awayekî di nav strane de derbas dibu û xorta govend girtibu ew hate bira Mele û ev agahi şande weşanên Deng û wan jî di çapa nujen de ew kêmasî ji holê rakirin.

Rengvedanê ku di nav dîroka kurdî de cî girtine û ji sedsala ve di hafiza gel de mane û hatine heta roja îro, bi xêra mejiyê devkî ye û bi alîkariya stranbejiye berdewama xwe bi rastî rêk û pêk kiriye, wexta go em dinav çanda mitirbiye jî dinerin em dibînin ku dinav gelê Turabidîn de bingeha mitirbîyê jî wek dengbejîye, her çikas hindik jî bê dîsa çêbuye.

Dîroka kurda di warê nivîskî de hebekî li paş maye, çima ji bo ku gel zêde bindest maye û perwerdehiya wan gelekî pêşneketîye, di bin zordestiyê de mane û zilm û zorî gelekî dîtine, jiyana wan jî bêhtir wilo derbas buye, gel şopandina çanda xwe jî bi riya dengbejtîyê û mitirbiyê bi pêş xistiye, ez li gelek dewleta geriyam bi rastî min tiştêkî pir balkêş dît. Gelê me li ber strane ku mitirb dibejin dirakisin, le ev stran baxsa şer, mirin, kuştin û zilmu zorê dikan ev taybetî bi serê xwe tiştêkî balkêşe û tez li ser tînan nivîsandin. Ev jî didê xuyakirin ku gelê me bêhtir êş û elem dîtiye û ev dîroka xwe û buyerên di hafiza xwe de bi riya dengbêjtî û mitirbîyê berdewam kiriye û anîye rojame.

Tirkî gelekî buyerên nexweş derbaskirine wek ihtîlalê ku bune, wek şoreşên ku gelê kurd kirine bi rastî di dîroka menî sedsala nêzîk de pir cî girtine, wek ihtîlala 80'ê yan û pê de dezenformasyona li ser gele ne Tirk pir zêde bu û mirov xwe disipart cîkî baş û jiyana xwe dixist bin bandora cîkî. Em dibînin ku mitirb her çikas ji etnîstêkê dî jî bin bi kurdatiyê ve hatine girêdan û bune wek qiraxa xêşîrekê û bi xêşîra re jiyana xwe şopandine, gelek caran em dibînin ku gelek dengbej û mitirb bî axa rene û ji wan re li ribabê dixin.

Mûzîk dinav gelên rojhilata navîn ji bo bandora îslamê hebekî li paş maye. Ji ber vî hawî di nava kurda de jî ev meslek bêhtir bi riya mitirba hatîye şopandin. wek mînak wexta ku ji mirovekire dibêjin “Ma ti mitirbe kuro! tu strana dibeje ma tu ji bavû qalê xwe fedî nakê” ,ev tenê jî didê xuyakirin ku mitirbî an jî dengbêjtî hebekî antîpatîk tê dîtin.

Wek me li jorê jî destnîşan kiribu dinav gelek gelên dinyayê de gelek buyer bi xêra mûzîkê hatine roja me ji ber ku veşartina û cîgirtina strana di mejî de bêhtir rixete, gelek gel bi xêra strana gelek zimana diparêzin. Minak li Bolîvyayê çend ziman hew di strana de mane di kolana de ji ştexaliye ketine, bi wi awayî liv ê dewletê 37 zimanen fermî hene dewlet wan zimana him diparêzê him jî bi riya wan zimanên zindî ji kuştinê xilasdikê. Em dinerin ku bi armanca botanik ve giredayîye ev mijar ne ku tene ji bona hafîzê him ji bona gelek zanistiyare jî stran weke surekêye.

“Li herema Botan û Tur abîdinê de wexta êvaran civata axa dirunişt mitirbê wan jî li kêleka wi dirunişt û li ribaba xwe dixist ew şev xeta dereng bi gotin û lêxistina ribaba wî derbas dibu ez bi çukaya xwe li Xevdoyê Mitirb gohdar bum û li gori ku bavû kalê

me dibejin M. Elîye Mitirb bi şev heta sibehê buyerek xilas nedikir. Mûzîk hilgirtinekê çandî bi gelek wateyî gihandiye îro” (Keskin 2006: 50).

Li herema Turabidîn de em dibînin ku wek kevneşopîyeke cûda tê pêşîya me ew jî ev e ku axa û mîr ê wê demê her wextî di nav girgirêkê xwe de ya yekî mitirb yan yeki Ezîdî-filleh li dora xwe digerandin û wan şevê direj wan kesa civat reng didan.

Wexta ku em dinerin di nava vê kevneşopîyê de hafiza bandorekê mezin hildigrê ji ber ku ev kar tenê ne bi lêxistina ribabê dimeşê divê mejîyeke gelekî jêhatî jî hebê ku mero karibê vî karî ragirê, wê demê qaxiz jî tûne bu ku lê minerê û bêjê, ji vê yekê tenê mejîyê wî alîkariya wî dikir ev jî ciyê hafizê didê xuyakirin.

“Dîroka hafizê dinav gelan de her çikas ji hev cûda bê jî wexta ku tê ser hilgirtina dîrokê û çanda geleri em dibînin go dinav gelên cîhanê de wek kolektîvîtiyekê heye u xwe bi hevdure destnîşan dide” (Assmann 200 :69).

Di pêvajoya dîrokê de buyerên go bune di hafiza gel de cî digrin, tiştê ku mirovan di ware manevî de li ser nîga dihêlê û dîroka wî biwate dikê ewe ku dinav jiyana xwede tiştê ku di mêjîye xwe de bicî kirine û anîne heta îro, em van nîşeya jî dinav jiyana gel de di nav çand û hûnera wan dibînin, bi awayekî dîn jî ew mînakên hûnerî xwe dinav stranên gel de xwe didin xuyakirin.

“Heta ku nivîsandin hate dîtin, tecrubeyên gel û bingeha çandê bi tekiliya wejê û dîroka devkî hatiye heta roja me” (Ersoy 2004:103).

Li gorî nerîna modern her çikasî pêşketina teknolojiyê di warê devkî de çikasî nebaş bê dîtin jî em li gorî termînolojiyê dibînin ku alîkariya beşên devkî îro jî bandorê li roja me dikin ji ber ku em di warê hafizê de alîkariya wan beşan pir dibînin.

2.2. Di Nav Kurdan de Veguhezêrên Çanda Devkî û Hafizeya Civakî

Çanda kurdan ji aliyê berhemên devkî ve gelekî dewlemend e. Her weha heman dewlemendî ji bo kesên ku ev çand heta îro bi xwe re anîne, bi nîfşê nû re veguhastine jî dikare were gotin. Çîrokbêj, stranbêj, aşiq, derwêş, dengbêj hinek ji wan kesan in. Heman tişt ji bo mitirbên herêma Torê jî dikare were gotin. Ew jî bi kevneşopiya xwe ya bi salan, di nav çanda devkî ya kurdî de cihekî girîng digire. Di vê xebatê de tenê bi kurtî li ser dengbêjî û mitirbiyê rawestin.

Dengbêjî di nav kurdan de cihekî xwe yê girîng girtî ye. Wêjeya kurdî ji aliyê dengbêjîtiyê ve jî gelekî dewlemend e. Bi xêra dengbêjan çand û hûnera kurdan pêş ketiye û heta îro bi

awayekî zindî gihaye me. Di dengbêjîtiya kurdî de destan, çîrok, kilam hwd. cihekî girîng digirin. Bi taybetî cihên kilam û stranan jî gelekî girîng e.

Kilamên kurdî, beşek ji rûpelên dîroka me parastine. Em bi saya wan li ser gelek bûyerên girîng dibin xwedî zanyarî. Her yek ji wan li ser dema xwe ji alîye çandî civakî, ziman û hwd. Gelek nîrxan di xwede dihilînin. Li ser lehengiya kesayetan li dijî dewletê, li ser şerê birakujî û hiyanetê; beşek ji wan jî li ser evîndariyê hatine gotin. Hinek ji wan kesan weke mîsalên xirab û nebaşiyê, şexsîyetin jî ji wan dibin nimûneyên merdî û lehengiyê.

Di nav kurda de şaşîyek di derxekê van nava de heye, wexta ku em dibêjin mitirb an jî kereçî ya jî dengbejtî, mirovên ku agahî zêde nestandibin wana wek hevdu dizanê û cudatiya wana ji hevdu nikarê bikê.

Mitirb bêhtir li ser hafîza mûzîkê bi kar anîne û jiyana wan jî bi vê taybetiye li gora gerê û kêfê derbas dibe. Dengbej behtir li ser hafîza dîrokî sekinîne û behtir çanda dîrokî temsîl dikin behtir karekî birumet dikin, em vê nerîne li gorî nerîna gel dibêjin, çima, wexta ku em dibêjin dengbej ne weke mitirb te kebul kirin her çikas şaş be jî li gorî nerîna gel dengbej ji mitirba behtir xwedî qedrin.

2.2.1. Dengbêjî

Ev peyv ji du peyvan pêk tê: deng û bêj. Bêj ên ku reng didin deng, dibêjin, rûh didin deng an jî ên ku deng zindî dikin. Dengbêj, nefese dide deng û deng di vegûhezêre mûzîkê jî. Wekî din dengbêj, vegûhêzên bîra hevpar in. Dengbêj ew in ku bîre zindî digirin.

“Peyvên ‘Deng û bêj’ bi taybetî tê wateya ku dengbêj pisporê deng e. “Wekî din dengbêj, ên ku destana bi profesyonelî dibêje”.

“Lê dengbêjîtiya cîhanê de jî û di ya kurdî de jî dengbêjîti ne ev tenê ye. Wekî din dengbêj, deng dike stran û mûzîk jî. Dengbêj; ji meriv re, ji mirovatîyê re zimanekî, dîrokekê, kesayetekî, nasnameyekê çê dike” (Mutlu 1996: 55).

Dengbêjîti, hunereke deng e. Ji bo ku meriv peyvekê bi peyvekê ve bikê, pêwîste ku bi aqil bê, bi hûner bê û şahreza bê. Dengbêjekî baş, pêwîste tiştên ku deng kirî bêxe bîra xwe û bi heman şiklî, ji xwe jî tiştên bêxê ser de û devera ku heriyê de bibê wir, li wan deran belav bike (Erhat 2006 :264).

2.2.2. Mitirbî

Wek kul i jor hate gotin, bi kevneşopî û rola xwe ya diğ civakê de mitirb û mitirbiya herêma Torê jî cihekî girîng di çanda devkî ya kurdî de digire. Wan jî weke dengbêjên li herêmên kurdan ên din ji aliyekî ve çanda devkî, hafizeya civakî û “dîroka nêzîk” ji bo nîfşên nû veguhastine; û ji aliyê din ve jî ji bo kêf û seyranê dîlok û stranên xwe gotine. Ev hemû tişt jî bi kemaçeya xwe ku buye parçeyekî nasnameya wan gotine.

2.2.2.1. Ribab (Kemaçe)

Ribab an jî kemaçe amûreke têlî ye ku bi taybetî li Rojhilata Navîn û Asya ya Navîn di çand, hûner û mûzîka gelan de cih girtiye. Ev amûr, ji cureyên cur bi cur pêk tê. Hejmara têlên ribabê di navbera 1-5 têlan de digûherê. Lê ribaba 3 têlî zêdetir tê bikaranîn. Têlên ribabê bi taybetî ji dûv ê hesp ê tene çêkirin.

Ribab, di mûzîka tesewûfî ya Mevlevîyan de jî cihekî girîng girtiye. Ji sedsala 18 an û vir de li Kurdistanê bi taybetî jî herêma Torê (Merdîn, Şirnex, Elih, Sêrt û hwd.) tê bikaranîn. Ribab di dawet û şahiyên kurdan de xwedî cihekî jênager e. Dî şevbûherkên kurdan de hin dengbêjan ev amûr di ber gotinên xwe de jî gelekî bikaranîne. Ji van dengbêj û hûnermendan ê herî navdar ku bi navê “Mîrê Ribabê” tê naskirin Miradê Kinê ye.

Piştî danasîna van her dû şeweyên vegotinê, li vir ji bo berawerdikirineke giştî dikare were gotin ku;

Dengbêjî bi rêkê xeşîrtî şopê diajo û bêhtir bi çaxvekî mezin li xwe dinerê, di warê hafiza çandî û hilgirtina dîrokê dengbêjî jî mitirbîyê bêhtir bi bandor, lê wextê ku bi hûrgilî em li herduka dinerin herdu ji hafiza çandî di nava xwe de hildikşînin û dîrokê bi riya muzîkê û ribab û tenbura, bilura tînin heta roja me, barkirina hişmendîyê barekî girîng em dibînin ku dengbêjî bi armanckê dîrokî riya xwe dişopînin lê mitirb bêhtir li ser keyfê û xweşîyê hafiza gel diajon.

Wexta ku em li herema Tur abîdîn dinerin em dibînin ku rengvedanê bi têkilîyê dengbêj û mitirban ji hev cûda ne, wexta ku Şakiro destê xwe dibê ber guhê xwe û şer dibêjê bêhtir mero dibê dîrokekê kevin û wê hişmendîyê di mejîyê me de çêdikê û em bêhtir pê hembêz dibin gelek caran, gelek mirov digrî jî; le wexta ku em li Mirado dixisin çikasi buyerekê dîrokî û encama wê bi mirinê bê jî, behtir bi watekê keyfî dibêjê an jî koma hezex wextê li kemaçe dixin reqsa mero li ber wan te.

BEŞA SEYÊMÎN
RENGVEDANA DÎROKA NÊZÎK Û HAFIZEYA CIVAKÎ
DÎ STRANÊN MIRADÊ KINÊ DE

3.1. Jiyanê Miradê Kinê

Miradê Kinê di sala 1943'an da li gundê Gêracahfer ê ku bi navçeya Kercews a Êlih ê ve girêdayî ye ji dayîk bûye. Heta xortaniya xwe li Gêracahfer jiyaye. Piştê di çardeh saliya xwe de bi malbata xwe re bar kiriye navçeya Mêrdînê Kerboran. Bavê Miradê Kinê Ferhat û apê wî Reşît di warê ribabê de pir pêşketî bun. Mirad, li cem bav û apê xwe hînî ribabê bûye û di warê ribabê de gelek tişt ji wan wergirtiye.

Miradê Kinê, her çiqas li cem bav û apê xwe hîn bûbê jî gelek caran bi tena serê xwe bi awayekî veşartî ji bo bipêşxistina hûnera xwe xebitiye. Ev hostayiya wî ya bêhempa, di bûyereka tesadûfî de derdikevê holê. Miradê Kinê, bi apê xwe Êsiv re ji bo serdana xizmên xwe diçe Sûriye yê. Civat, daxwaziya lêxistina ribabê ji Êsiv dike. Êsiv fedî dike ku li pêşberî civatê li ribabê bixe. Tevî israrkirina civatê Êsiv li ribabê naxe û ribaba xwe didê destê Mirad. Gava Mirad li ribabê dixê civat şaş dimênê û bi awayekî heyranmayî lê gûhdar dike.

Xortekî bîst salî bû hûnera xwe, coş û kelecaneke mezin dixê dilê civatê. Dema ku Mirad li ber dengê ribabê strana bi navê “seyrê” dibêje, apê wî jî fêhm dikê ku Mirad hûnera xwe gelekî pêş xistiye. Êsiv jî bi vê hostayiya Mirad gelekî serbilind û şa dibe. Piştî ku vedigerin Kerboran ê di demeke kin de Miradê Kinê bi nav û deng dibe, dengê wî yê zelal û efsûnkar li herêma Merdînê belav dibe. Îcar Mirad bûye jênager ê şahî û dawetên kurdan.

Rojekê Şerafettîn Elçî ku wê demê Wezîrê Avadaniyê bû li Enqere yê li mala xwe Mirad dike mêvan. Elçî, ji bo hezkirina xwe ya li hemberî Mirad dixwazê xelatekê bide Mirad an jî ji bo

wî tiştêkî bike. Bi pêşniyarî û referansa Elçî, Mirad dibe karmend û li Mîdyat ê dest bi karmendiyê dike. Piştî du salan tayîna wî derdikevê Sêrt ê. Mirad tevî karmendiya xwe, hûner a xwe jî bi rêve dibe. Miradê Kinê, her çiqas li dawet û şahiyên stranên xwe gotibin jî ew hûnermendekî welatparêz, dilsoz û hişmend bû. Wî serhildanên ku di dîroka kurdan de cih girtine, bi awayekî epîk anîne ziman. Mînak: Eliyê Betê, Bişarê Çeto, Eliyê Ênis, Cemîlê Çeto, Dersim û hwd.(Aksan 2013 :10).

3.2. Rengvedana Dîrokî Di Stranên Miradê Kinê De

Em dizanin ku dîrok beşeke pir qur û dirêj e ev taybetî bi tenê jî ji dîrokê re qadekê lekolînkirinê ya gelekî berfireh dide xuyakirin, dîrok wek ku me di pêşgotinê jî anîye ser ziman û destnîşan da, tiştêkî gelekî girînge jiber ku gelê cîhanê hemu li ser dîroka xwe lekolîna dikin carna bi alîye destgirtina fermî carna bi ware serbixwe be an jî bi awayekî lekolîna ku dewlet jibona destnîşandana mijarna an jî li gorî biryarên dadgeha rêkekê berfireh ji dîroknasa re divekê û derfêta lekolinkirinê liser didê.

Dîrok tiştêkî gelekî pîroze. Ji ber ku agahiya li ser gele kevin, gelekî ji mere girînge wexta ku ev tarîxa kevnar bi awayekî objektîf neyê nivîsandin an jî nedê xuyakirin ji bona jenerasyonê pêşerojê tiştêkî gelekî lewitî te pêşya me, bi vê armancê di vê dîrokê de her çikas zilm û zordestî, tekveçun hebê jî, divê be xuyakirin, wek mînak em wexta dîroka fermî di dibistana de didin, li ser gele jiyane em dibêjin dîroka filan gelî objektîfe ji ber ku herbê ku zorya wan çuye jî rast nivîsandine, wexta ku me dîroka xwe ne serrast nivîsî jiyana gele cîhane xemuya dilewitê.

Zemanê bere ji ber ku nivîsandina ku em niha zanin tûne bu gelek gel buyerên xwe yen di nava strana digihandin pêşeroje û pîrik û bapîra bi awayekî devkî ev şop didomand, bi vê yekê ji wejeya devkî bi dîrokê ve gelekî giredayîye û di zaningeha de bi vê armancê beş vebune,

Îro li ser cîhanê nêzîkî 7 hezar ziman hene yê ku tene ştexilandin gelek ziman ji wan ji alîyê çend bapîr û pîrik ve te şitexilandin. Mînak li Bolîvyayê tenê 37 zimanen fermî hene ji xeynî yen ku di nav kebîleyên biçuk de tene ştexilandin, hin ziman ji wan di nava stranên de tene mane, hin ji wan di nava zanista botanîk de mane.

Dîroka kûrdî jî herçikas di nava dewletê cîran de hebê jî û hatibe nivîsandin jî bi giranî bi riya devkî hatiye şopandin, ev bi sere xwe pirsgirêkeke mezine û em karin gelek sedema destnîşan bidin le ez dixazim li gori mabesta me bidin xuyakirin.

Dengbejtiya kûrdî gelekî dewlemend e ev rastî li gori lekolînerên cîhanê jî hatiye destnîşankirin mînak “Alexandre Jaba” sedemên ve jî gelek in ji ber ku gelê kurd gelek dema di bin zilm û zorê de maye gelek zahmetî ezîyet kuştin heps dîtine, miroven kurd jî bala xwe da ser mêjî û hafiza xwe û ev êş û eleme nava xwe anî ser ziman û bi qedera nava xwe terbiye kir di nava dengbejîtiyê de bi cî kir, em dibînin hafiza meyî liser hilandina dîrokê gelekî pir e çima ji ber ku derfêtê di destê gel de pir hindik bun û li gorî dadgeha fermî jî gelek tişt qedexe bu, gele kurd di hafiza xwede gelek buyer veşartin

Di nav stranen kurda de tişteki gelekî balkêş heye bi rasti li gorî lekolînkirina xwe li nav gelek gela ez gerîya me min bi giranî ev taybetî dinav stranên kurda de dît, gelê kurd di stranen xwenî ku li ber wana di daweta de dirakisin jî êş û kuştin û şer heye, em dinav stranên ku em li ber wan dirakisin û govende digrin jî bahsa çek û sîlah û berxedan û kuştinê dikin ev bi rasti tişteki balkêşe çima ev wilo buye ji ber ku mejîyê me bi piranî mirin kuştin zilmî tişteki sûrişt dîtiye.

Di nav stranên mîrê ribabê Miradê Kinê jî bi rastî gelek dewlemendî heye em dibînin ji erotizmê tavêjê dîrokê ji dîrokê diçe fanîtiya cîhanê û dide nav kêfa cîhanê, Mirad di dengbejtiya mê de pir dewlemendîyek çêkiriye, em dibînin ku di karê dewletê yê fermî jî kiriye lê ji dev ribaba xwe bernedaye û ev şop domandiye, gelek buyeren ku di hafiza kurda de cî girtine bi hêza ribaba xwe bi awayekî keyf û xweşî gotiye û mirov lê hisandina wî qet xadiz nebuye û bi sala ev staran li ser ziman cî girtine

Di nava stranên Mirad de bi zêdebun dîroka nêzik heye ev dîrok li gorî xerba cîhanê ya mezin û pê deye, ji şoreşa Xaco û heta bê Cemîlê Çeto, Bişarê Çeto û Xelîkê Betê firmana Seît Axa û ku li ber dadgeha Fransayê şer kir û li xetê xist û heta ku bê dewleta Tirkî ya Cumhuriyetê û heta nêzikî dilovaniya wî tê de cî girtiye.

“Wexta em li herema Tur abîdin dînerin em dibînin ku gelek cûdatî tên peşîya me, wek em li mitirba dînerin em dibînin ku peşî di bin bandora axa û xeşîra de bun piştî netewetiya kûrdîtiyê ew jî di bin siya kurdîtiyê ji xwe re cî girtin û bi awayekî nasnameyî xwe derxistin pêş” (Keskin 2006: 52).

Mûzîk di nav gelên Kurd de niha her çikasî bi dengê êş û elemê tê dîtin jî, pêşî wek meslekekî qeşmertiye dihat naskirin wexta em li dîrokê dînerin jî wilo tê dîtin, çima wexta gel xenekê

xwe bi yekî dikê jê re dibêjê tu wek mitirbaye! Ev nerîneke gel ê, bi piranîyê û em dinerin ku mûzîk beşeke ku mirovên ji xwe nerazî pê dilebikin, her çikas xelet bê jî ev di mejîyê mirovan de cî girtiye.

Bi ve armance li jêr mînakên di nava stranên wî de em karin destnîşan bidin.

3.2.1. Saîdo Axa

Saîdo axa me şerekî danîya li binya Girê Amûdê... Bi demanayê...

Û wala wezê li ezmana dimeyzênim li mi xweş tê dengê va mîratê uçaqaê... bi teyaranyê...

Û wala wezê li erda dimeyzênim dengê va mîratê Pîqap û teqşîyano.. û va cemsê...lo va fortanayê...

Û wala tiwê raba mera ji eskerê Îngîlîs û Firansa wî û tiwê bikûjê...lo bika qasepxanayê...

Û wala wextê Saîdo axa dikevê nav şêra da... û wala sawa wî aynî minoyê sawayê...lo raste Mîr zanayê...

Û wala wextê ku dikeve nav şera da ewa qesabê serê mêra yê...lo va însanê...

Werê hê dibajo.. Saîd axa...de hêdî di bajo...bavê mi hemayê...de hêdî di bajo...gula siwara yê...

Saîdo axa me şerekî danîya li binya Amûdê wezê dênê xwe didimê... lo li min xistiy...

Û wala tiwê raba mêra ji askerê îngîlîs û firansawî û tiwê ji wa bikûjê... bavêjê erdê...

Û wala hemû ji bona vê namûsê... vê xîretê...

Û wala qena herkes û dinya alamê bêjî Bavê Mihamed

Û wala roja tengî...lo bi kêrî me tê û wala vava hawara Evdiyê Fulo Silêymanê evdê sewarekî girana...

Û wala vaye ji dur mayê... lo ji te re tê...

De re hêdî bajo seîd axê...de hêêdi bajo de dibê zingilê şerayê....

Saîdo axa minê deynê xwe dayê binya Amûdê li me qewimîyê... lo gamîş te ra yê...
Lê lî belê wala roja tengiyê filan roja şerê xewayê wala ti wê mêrekî baş bayê... bi kêrî xwe werayê...
Wala ti wê mêra ji askerê îngîlîs û firansawî bikûjê... ji xwe ra mêra yê...
Û wala heta temenê kiyametê bila ev namûs û wala xîreta hemîkîyê bîmênê... ji navê te ra yê...
Û vava hawara Evdiyê Xilo Silêymanê Hemê siwara mala Haco...
Û wala girana yê... lo wê bê ji te rê...
Dere hêêdi bajo Seîd axayê... de hêêdi bajo... kirikê şera yê... de hêêdi bajo... ho.. gûla siwara yê...

Ev strana ku ji aliyê Miradê Kinê ve gelek caran û li gelek deveran dihate gotin di heman demê de buyereke dîrokî ye jî.
Dirok beşeke serbixweye wexta ku me behsa hafîzê û şopandina dîrokê bi alîkariya mûzîkê berdewam dibu em dinerin ku li gelek herema wek vê taybetiyê tê li darxistin,
Wexta em li çavkaniye gele dora me dinerin em ji bona buyeren ku li ser kurda hatine nivîsin em gelek tiştê cuda dibînin, ji ber ku dewleta kurda tune ye û heta demekê nêzîk jî naskirina wan di ware fermî de tune bu ,nîşeyên ê çavkanîyê wanî nivîskî jî bi vê awayê tune bu lê em ji bona buyeran karin di hafîza gel de gelek rastiya li destbixin.
Em li gorî strana mirado a Seîd Axa dibînin ku hafîza mê diçê heta dadgeha fransî a li herema rojava û liwê demê buyerên ku derbasbune û têkilîyên wan kurdê li heremê û fransa di warê serxwebunê de çawa bun em karin agahiyê bistînin.

“Sala 1896 Xacoyê yekemîn li çiyayê mava li hemberî Xeşîra Dekşuriya û dewleta Osmanî şerê xweserîyê dabu li mikabilî Dekşuriya û dewletê hevêrkî tenêbun û kesî ku alîkariya wan bikê tune bu ji xeynî Seyid a “we demê dibin konfederasyona heverkan xeşîret konfederasyonî de 24 şax hebun yek ji wan jî “Seyid” bun û alîkariya Hevêrkan dikirin.” Wexta cimo serê Xaco jêkir serê wî anî qesra Mala Cibo ji bona ku qesra Mala Cibo wek qesra temsila Seyida bu ji bo ku wan bitirsînin serê wî anî mala Mixemedê Cibo û bi mûfreza dewletê re wê heremê xwestin bixin bin temsîla xw” (Cibo 2010:196).

Şekîp Xaco jî di vî warî de wiha dibêje;

*“Xanima Xaco çu surîyê û Xacoyê ku serî liber fransa rakir û zilm û zora li rojavayê xilaskir di zikê dayika xwe debu ,generalê Fransa Rolgan mirovên kurd di nav xerdê de diçandin zilma dikir binav û deng bu,Xaco serê wî jêkir û hate girtin ji alîye Fransiya ve û birine Parîs ê keç û xanima Rolgan ew xefu kirin û dîsa vegeriya Surîyê.
Ji bona vê serxwebunê şoreşa kurdê li wê herema Surîyê gelekî hate berdewam kirin ez karim biwejekê ku li rojavaye te gotin bejim”*

*Tirbespiyê bizîze
Kesi nekir namuse
Ji xeyni bave Şêxmuse.*

Seit Axa li Amudê li mikabilî dadgeha Fransî a kolonyalist serî rakir û şer danî lê wek ku di dîroka kurda de buye weke kangrenê ,xayintiya hevalên wî dîsa dubare bu û Newafê Hesên bi destê Fransa girt û xemu li Seit Axa bune yek.

Di navbera dewlata Tirkî ya nu û dadgeha Fransî ya li Surîyê di 1926 an de ev sinorê em zanin hate danîn jêre digotin ser xetê û bin xetê lê 1956 an de mayin hatin danîn.

Seit Axa ji bona xayintiya hevalê xwe û jiber ku Fransî ji aliyê eskerî ve xurt bun bi jîpa xwe hate ser xetê û derbasî Irakê bu û çu nav kurdê wê derê” (Xaco 2007 :10).¹

3.2.2. Elîkê Betê û Şoreşa li Tur Abîdînê

Elîkê Betê

Ax lê lê dayê... wey lê lê dayê... wey lê lê dayê...

Ax lê lê dayê... wey lê lê dayê... wey lê lê dinyayê...

Û lo lo axaoo... wezê çûma Sitê ti nehatê...

Û wezê dênê xwe didimê zinarekî bilinda... lo lo bira zinarekî gelekî li herema...

Û de lê lî belê... sê cara şevbûnê Eliyê heydo...

Û bavê korê... gazî kira Elîkê Betê bavê Ûsif û Mihemed Nezir Siltan hevêrkaaam.

Go tiwê rabe ser xwe... û berê Alamanîya navê mûmata giraaan

Û eskerê hûkûmatê bişixûlîna bi kek û dengê tivinga tev lama lamaan

Û lo lo axao... şewanê Xwudê li can û cesedê mi ketibî...

Û mitala neka... roja ku li te biqewimî binya Çiyayê Mixrê sitê ti nehatî ...

Û wezê tera evqa mûmata giraaan evqa eskerê dî hebaaam

Û wala roja lî te biqewmê ti ribatî wez celabê te maa hey lo... de ho...

Û axao bila Xwudê ji te razî bê... Û axao bila Rebbê alemê ji te razî bê...

Û bila derheka Elîkê Betê bavê Ûsif û Mihemed Nezir Siltanê hebê ka bila xwîna mi biherikê weke mezîdê...

De roja şerê tinatê bila serê mi bi qurban vi serî bê de rabe û axao hey lo... de hey lo...

Ax wey lê lê dayê...

Û axao li halê min û li vê xemînê... bira li halê min û vê xemînê...

Û roja tengî bê hawhawê kurê camêra terqênê darê mitilyoza kesek wê kêkîyê dostê Xwudê bi ser û çavê xwe nabînîm.

Û de lê lî belê... Ser serê Elîkê Betê bavê Ûsif û Mihemed Nezir Siltanê hebê ka bûya roja qetl û xwînê...

Û de lê lî belê... De çawa waye qaymaqamê Nisêbînê û ciwabê didê walîyê Mêrdînê...

Û dibê Alo Alo a telefonê wa ciwabê didine xopana bajarê meclisa Anqara dîsanê welatê Tirkîya hemîya pê dihesînê...

Û de lê lî belê... ewê derabin ewraqê mala Haco... û Elîkê Betê li wê dê bavo ji balbat û ji deftera çawa digrû dixwîniin.

Û de lê lî belê... eskerê Ezedînê temo gewrê Silêmanî Hemoyê û Ehmed

¹ Hevpeyvîna bi Şekîp Xaco re li bajarê Qamişlo, 2007.

Û de çawa we go waye derketye devê binya Çiyayê Mixrê..
Û de vayê hêdî hêdî hawîrdorê wî girtina û dilezîniin.
Û sê cara şemûnê Elîyê Heydo bavê korê Siltanê hevêrka...
Û de lê lî belê... çawa lê dikî gazî...
Û dibê wezê destê xwe bavêjma darê camêzarê bereda vê xençerê bikime roja qetl û xwînê...
Û wezê bikevme pey vê mûmata giraaan
Û heta berê wa rast bikim li qapîye Sûrê ser girê Nisêbînê hey lo... de ho... de ho...

Û Axayo li me firmana... xeşiyêno li me firmana...
fermana Elîkê Betê bavê Ûsif û Mihemed Nezir dane me li wane çîqa girana...
Û firmana wî rabûa ji xopana bajarê Anqara û Stembolê...
Û de lê lî belê ji wê meclîs û दौरا ji ber kaba siltana hey lo... û hey lo... de hey lo lo...

Ax wey lê lê dayê...
Û lo lo axao... me şerekê danîbû... û li Sinê ti nehatî...
Û li bare gere nekîir û li binya Çiyayê Mixrê... lo lo axao li tenîştâ Sinê ti nehatî

Û de lê lî belê... û sê cara şevbûnê Elîyê Heydo bavê korê..
Û li Elîkê Batê bavê Ûsif û Mihemed Nezir dike gazî...
Û dibê divê tiwê bîyami bikê wezê rajme darê xencerê nivê tivingê vê beraaadim
Û wezê ji vê mûmata giran wezê bi tenê derkevime vê meydanê vê tiratê..
Û ti nizanî rojekî çî mi sozekî ji te re daye ti cara serka axayê xwe nadim
Û wala ku serê mi lê werî ber bîrînê ber celadê...
Û ti cara şim û telika(terka) Elîkê Betê ti car û ti car nadim
Û wala wezê bikevima pey vê mûmat û eskerê giraan
Heta berê wa rast bikîim û nava wa sikak û zamboqê nava Midyadê hey lo...
û axao hey lo... xeşmêro hey lo... û axayo hey lo...

Û axayo bila Rebbê... alemê bila jite razî bê...
Û bila wextê... Elîkê Betê bavê Ûsif û Mihemed Nezir dibû gazî...
û dibû tengî.. bila serê mi bi qurbana wî serî bê...
Û derheka Elîkê Betê de bila xwîna mi biherikê weke şerikê mezîdê hey lo...
ax hey lo... û axayo li me firmane lo...

Ev stran jî dîsa bilevkirina buyereke dîrokî ye. Li herêma Torê carina ji bo vê buyerê “şoreşa Elîkê Betê” jî tê gotin. Bi serhildana Elîkê Betê û Mala Osman ve girêdayî ye.

Mala Osman malbatekê hevêrkî bun û her dem di nav kurda de bi navekî rumet dihatin naskirin. Wexta em bahsa serhildana elîkê betê bikin divê em bingeha wênî dîrokî jî zanibin ji ber ku hafiza çandî di nava gel de her dem xwe nujen dikê mînak wexte ku li herema Tur abîdin de yek cira xwe nexweş dike jê re dibêjin ma tu Êlîkê Betê ye.

Li jor me goti bu mitirbî û dengbejtî ji van buyeren dîrokî bingeha xwe distîne û bi wan berdewamîya xwe dikê û dewlemendiya dengbejtî dike. mitirb zêdetir li ser kêfê buyeran dibêjin û dengbejtî bi awayekî dîrokî dibêjin . Mitirb temsîla li darxistina mûzîkê bêhtir temsîl dikin, Miradê Kinê jî wexta van buyeran bi ribabê dibêjtî , mirovên dora xwe dibe we dîroka

ku buyer derbasbuye û hafiza mirov nujen dikê ,her çikas bi təkiliya ribabê bê gotin jî dewlemendiyeke giring di vê kevneşopîyê de heye.

Elîkê Betê ji Mala Osmane. wexte ku Haco Axa ji destê Cimo û alîkariya Dewleta Osmanî hatê kuştin û serê wî jêkirin. Eşîra heverkan be serî ma û di nava wan de jibo serokatîyê pevçun derket .Çelebî û Elîkê Betê her çikas pismame hevdu bun jî, di nekeba wan de şer derket, Çelebî dekşurî bu û Alîkariya dewletê dikirin .

Di herema Tur abîdin de ji berê de di nekeba dekşuriya û hevêrkiyade şer heye û ev mijar di hafiza gelde pir cî girtiye, her wiha wextê ku te li cem yekî dekşurî te bigota ez hevêrkî me karîbu avê jî nedê te.

Elîkê Betê, wexta ku li mikabilî êrîşên Ermeniya ji destê “*Hamidiye Alaylari*”ve li himberî Ermeniya ji bo ku kurd alîkariya wan nekin ,kurd hatin girtin û ew serokê eşîrên Tur abîdinê birin hepsa Harputê, Elîk û Şemunê Xenna ê Suryanî² ji xepsê bazdan û hatin heremê serî li ber Dewleta Osmanî danî û bî dest serhildana xwe kir.

Elîk pêşî da pey heyfa apê xwe Xaco yê ku serê wî ji aliyê Cimo û dewletê ve hatibu jêkirin. Elîk kete pêşiya Cimo û ew û kurê wî Huseyîn kuştin. Cimo serê Xaco jekiribu lê wî bi daxwaziya seyidekî serê wî jênekir lê guhê wan jêkir û hat bu serokê hevêrkan.

Li Midyadê Elîk serhildan diyar kir û berê xwe da Nisêbina rengîn, li Nisêbînê devê hepsê vekir û karmendê dewletê derdest kirin. Piştî derbasî Omeriya bu û bi Ehmedê Silêman re şêwra xwe danî lê Ehmede Silêman nehişt Elîk li Omeriya seroktiyê bikê û got qîma min nayê.

Serhildana Elîkê Betê wê demê alîkariya gelê kurd û Hiristiyan û Suryaniya jî kir. Gelek mirovên ku wê demê jiber dewletê bazdan ,bi alîkariya wî derbasî jêr (Surîyê) bun û ketin bin bandora desthilata Îngilîza. Jiber ku serokê eşîrê wê heremê pêre nerabun serxwe zêde dirêj nebu serxwebuna wî û di hezirana 1919 de hate kuştin.

Li jor min bahsa mijarekê kir a ku mirovekî seyid nehişt ku Elîk serê Cimo jê bikê, ev buyer mijareke pir balkêş peş me dîke ev mijar mijara seyidîtiye ye.

Seyid ji dema Osmaniyan ve heta wê demê di nav Tur abîdin de bingeheke mezin parastine û her demê jî temsîla aşîtiye kirine, keska wan li nav mirovan dibu peşxwaziya aşîtiyê, bi vê taybetiyê jî tu carî ji wan cirm nehatiye standin û navê gundê wan jî bi vê wateyê “*Bêcirman*” maye.³

² Em dibînin her axakî kurda, kesê herî nêzîkî wî ya yekî Hiristiyan yan Sûryanî an jî Êzîdîye ev jî mijarekê ku mero li ser tezê binivîsê.

³ Di nav hafiza gel de û di dîroka devkî de ev amintiya seyidîtiyê cî girtiye. Di arşîvê Osmaniyan de 39 lénuskê meşîhat hene û di wan de seyid bi şecerê xwe cî girtine.

3.2.3. Bişarê Çeto û Serhildana Heremê

Straneeke din ya ku Miradê Kinê dibêje “Bişarê Çeto” ye ku buyera Cemîlê Çeto û Bişarê Çeto dike. Stran bi vî rengî ye;

Bişarê Çeto

De re lêva yêê... leva yêê ...

Û Eminê dibêjê lo lo Heseno cirav ti mêrekî pîsî gelekî xirabî...

Û de roja dara Silo Hemzo koska kolanê kanê xirbê darê.

Û çîqa tiwê wesifdarê xwe bidê va berê Bişarê Çeto bavê şebab û dîtina mina o...

Û wala sosinê dibêjê lê lê beybûnê xweha minê rebenê deranê...

Û îro sê ro bi eskerê mûsika, welîya neqîba, guldira dela û şêxa ramayê jêrî...

Û ramayê jorî walîye Sêrtê, miserifê Belîsê, Qaymaqamê Zoqê, kurê Elîyê Yûnis axayê xombamê kûrê Xelîlê Silêman va xwe didê ber avê va

Û de vaye ra û şe û tedbîra xwe danîya...

Û se qesra baxemsê ser Hesênê Osman qetl û qedra navê lo lawo...

Û wala lê lê sosinê xwaha minê tiwê rabe karê û bara xwe bike da û deligê xwe ji ber hev û dil de bike

Û wemê rabin xwe avêjina ba Şêxê Zîla bila pepî sofî mirî di tobedarê dora xwe rabin.

Û neqebeyna Hesênê Osman û Bişarê Çeto serê çend sala ye neyartiya...

Û dibê ka ser destê va şêxa vasna va eşîra...

Û nu makuna dêka çênabê lê vayê... lê vayê ... de le vayê....

Û de gelî bira hûnê vê sebekê lê bidin şev girane va o...

Dere lê... lê vayê...

Wezê çûma Zoka şewitî bi dikane wezê hatima bajarê Zokê bi dikana...

Û de lê lî belê... wala Mişarê Çeto ji Hesênê Osman ra gotî go lo lo Heseno...

Û qesra ba Xemsê tewê ez kuştima bi va zirtan û gotinan û va vasifdana...

Û heke wezê Bişarê Çeto bim wezê timrik çê mala Faro bi navê min belav bûya waqa welat û şaristana...

Û wezê rabim malekî ji qesra baxemsê bidme erde wezê alêyê di bikima xurê hespana...

Û wala heta direta bavê we sax bê...

Û kesekê nebêjê wemê çûne pêşîya malê tican û poste û paşpa zingana lo lo...

Û wala bira li halê mi û vê gotinê li vê xeberdanê... bira li halê mi û livê şitexalîyêli vê xeberdanê...

Û Bişarê Çeto bi sûnd xwariya bi sûnda yamanê bi telaka jin berdanê...

Û go lo lo Heseno neyar bi halê neyar nizanê...

Û şevê dîtirê minê ji te kuştiya Heskê Reyso, Mecîdê bira, Xalîte Xwedê dayî...

Û de bere çardana va her sê bava egîda de şevê dîtirê minê bere wa daye Zîyareta Têlanê lo lawo lo...

De re lê vayê... lê vayê... lê vayê...

Û birano wê çibûwa, çi qewimîya... wextê dîsanê ber Mişarê Çeto ev xebera hanekê gotiya...

Û Emê Gozê wê devê qesra ba Xemsê li devê balqonê li ba Hesênê Osman rûniştiya...

Û go lo lo Bişaro ji bavê tera eyb û şerm û kêmayiya...

Û tiwê vê xeberdan û wasfê hanekê ji xwe dê nabêjî li nav civatê li nav me hemîya...

Û Bişar bakiryê go lo lo Emero ma ti nizanê îsal heft salê min û Hesênê Osman qediya...

Û berê bindikê erdê tev du edî ji vî estû girîya...

Û îsal heft salê min û wî qediyana naqebeyna min me mêr kûştine û neyartîya...

Û tiwê xwe ji naqebeyna min û Hesênê Osman bide alîya ma ya te çiyê lo lo lawo...

Û wala hecî pele tuyî tiwê heft sala xulamtiya mi kiriya...

Û tiwê nan û emekê mala mi gelekî xwariya.. tiwê ça û kahwa minê ode liber mêvana gerandiya...

Û Emo bakiryê go lo lo Bişaro wala bi serê bavê te kim ev xebera te rasta bi serê xwe ya doxri ya..

Minê heft sala xulamtiya te kiriya...

Minê nan û emekê mala te zaf xwariya...

Û wezê çi bikim minê soza xwe ji Hesênê Osman re dayiya..

Û wezê namûsa mêra ti cara darê dinyayê winda nakim

Û wezê nadime malê dinyayê saabetê zêr û xazîna lo lo...

Lê vayê... lê vayê...de lê vayê ...

Û gelî payayê mala... bavê min û vê sebekê şev girana lo lawo....

...(evder hatiye kut kirin)...û neyartîya...

Û de li halê min û li vê xeberdanê...

Emê Gozê sûnd xwariya bi telakê jin berdanê bi sûnda giranbada yamanê...

Û go lo lo Bişaro çiqê eskerê te zahfiiin

weka meya avê kulehê wê salê pelçimê dar û deriya hemiya kirkim bênim ber yamanê...

Û eskerê Bişarê Çeto eskerê dîsanê mûsika, welîya, neqûba, gurdila, dela û Şêxa...

Û ramayê jêrî remayê jorî û însanê bi ser Emê Gozê de hatine xwarê...

Û Emê Gozê rahişte darê camêzare xwe avête kozika kolanê jêre dibêjinê kanê xilbedanê...

Û wezê ser serê Emê Gozê dimeyzênim boçika ser tofanê roja kes nebînê weke sala firmanê...

Û de lê lî belê... dîsanê wê çibuwa çi qewimîya...

Û de hawirdorê Emê Gozê re nîna esker çawa wa tijîya...

Û de ewê laşê baba egîda axa de rabin û ka çawa dibê ûjdana meydanê çawa girtina wa diqûrpênin.

Û de lê lî belê weka pelçimê dar û devîya...

Û de carekî Emê Gozê li Bişarê Çeto kirbû qîrîn û gaziya...

Û go lo lo Bişaro hecî tivinga mina iro sê rojê wê ji bajarê dêr û dêr jimira hatiya...

Û hê minê fişek pê neteqandiya wezê nizanîm hetlê vê mîrata sûstema mi çiya...

Û va sê siwarê ketine Çemê Hopê binya Qumano...
Û de vane hêdî hêdî dimeşînin cilê wa şînin weka cendirman û va Romîya...
Û wala siwarekî kete serê siwara, siwarekî gelekî babi egîde terz efendîya...
Û wezê tivingekî berdimê wî siwarî dênê te lê bê.. bê kaaa hikmê vê sîstema mi çîye lo lo ...

Lê lî belê wextê carekî Emê Gozê awra xwe vê sîstemê kê mî kiriya...
Û dengê wê tivinga vî hatiya û çawa teqîya...
Û ez siwarê vê temtêlê zilamekî gelekî terz efendîya...
Û wextê ku terqênî ji tivinga wî hat çawa ev siwarê hanekê qayî ser dido wa dewara ser pişta dewara xwe ketîya...
Û de lê lî belê wextê Bişarê Çeto dûrebînê li va siwara rênîya...
Û bakiryê go lo lo Emero...lo Emero...
Û te agirê Halepê bi mala mi va danîya... mi ji dinyayê tefandîya..
Û wala ew Mecîdê birayê mi bû seh kiribû naqebeyna min û te biwa ne xweşîya...
Û hatibû ku me lev bînî bi baxt û bav û biratîya...
Û çawa tivinga te teqîya tewê li cîcka cîcka çepê dabû serê polê rastê daxurîya...
Û hin dibê malayê Bêkendê bi salîte we ne selîm.
Û hin dibê hê sax a û hin dibê na wala ji nava dîtirve mirîye lo lo....

Lê vayê... lê vayê...de lê vayê ...
De... wezê çî bikim Emê Gozê destê bi tenê bê.
De şêrê Elî bê denge naye lo lo...

Lê lî belê axa li xwe dîsanê dilê mi de meda...
Û axao dîsanê dilê mi de veda...
Û sê cara Bişarê Çeto li Emê Gozê kiribû qîrîn û gazî...
Û go lo lo Emero tiwê hênûka cixara xwe pipêça pakêtê li vê sîstema xwe da...
Û heka wezê Bişarê Çeto bim wezê tivingçîyê mala Faro bim.
Û navê minê belav bûye li vaqa welat û li va beled û li va memlaketa...
Û suuda mêra hemî ji kinarê hedê û Ehada
Û heke wezê Bişarê Çeto bim ezê nahêlim.
Û wala tiwê wî rihê şîrîn
Û careke dî veqerênî bi ser wê goza dayika xwe de lo lo...

Û wala li halê min û vê gotinê û li ve şîtexalîyê li vê xevînê...
Bira li halê min û vê gotinê û li vê xevînê...
Û ser serê Emê Gozê ber roja kes nebînê...
Û de çawa mi go Emê Gozê hawîrdorê kozka xwe tivingê dişûxlînê...
Û de laşê kûrê bava û axa ra çawa bi ser hevûdî da diqulbînê...
Û dîsanê vava Bişarê Çeto bi hikmê dûrebînê çavê xwe li bejn û bala Emê Gozê digerinê...
Û ti nebê li qayî mohra mecîdîkî guhê cara Emê Gozê bi zeraqa kozîkê da dibînê...
Û ewrê dirabê berê vê mîrata Alamanye li ser bejna Emê Gozê dihêlinê...
Û heyf û mixabina yeke waka Emê Gozê.
Û wala çawa dikê gulkê wê cara Trabzûnî...
Û zîncîr û fetlê seetê bostek û çar telî ya...
Û xwe tavêjna devê vê birînê lo lo...
Û wala Çira masî lo lo... mala Dibo...û de çawa ji dinyayê misafîrim axao lo...

Û wala çira mala Sîno... mala Dibo... ji darê dinyayê ditefîniim
Û Emo dehnê xwe dayê ku vava pîrekî cilê wê sorin ji Xemsê vayê hêdî hêdî tê û dilezînê...

Û desmale ji va desmalê Romanî wa bi destê xwe girtiya çawa ji Emê Gozê ra dilîzînê...
Û hatiye ji wê çawa dilîzînê dibê Emero de lê da... poz berano de lê da...
Û hedafa li ber çavê dijmin û neyarao de lê da... kêla derb û berao de lê da...
Û kûrê mino de lê da... Emero de lê da...
Û dûrî vê huzûrê... serê kuydê hatî careke dî nakevê tê da...
Û tiwê nebêja... evê hanekê filankes û kûrê bêvankesa...
Û tiwê tivinga Ewnî li bin çengê kûrê dewletê da...
Û kûrê mino çîqa dengbêj li dinyayê hebin û deqena dayê methê kûrê mi bidina nav camêra di nav xelkê de lo lo...
Û wala Emo bagiryê go lê lê yadê dilê mi de dema...
Û lê lê yadê dilê mi de dema... heta temenê qiyametê wez rebena wê mêraniya xwa ma...
Û wala minê ji xwe re digo wezê têra ewqa eskerê Bişarê Çeto evqa sî dîtir jî hema...
Û de lê lî belê Xwudê Teala bikê Bişarê Çeto xêra bikê li dinyayê xêra li minê...
derb û berekê lê dayê bejn û bala Emê Gozê...
Û wala yadê tiwê raba here malê...
Û te dibê li qay gûhê mirîkî dil û kezeb nema ti nabê kûrê te de lê...

Lê vayê ... lê vayê... de lê vayê...
Wezê xwe didima kozka kolanê...
Û kamê xirbedarê warê gundo... de pêjna Emê Gozê vê kêlîyê jimira naye lo lawo....

Lê lî belê dênê we lê bê bira wê çî bûwa çî qawimiya...
Û wextê dênê xwe danê ku dengê tivinga Emê Gozê nehatiya..
Û ev eskerê henekê carekî bûye dîteditê borîya hemî jî kozik ji tapî ji çepera carekî ji mewzîya..
Û carekî gazî hevdû kir bavo firefirê va nobetçîya...
Û de lê lî belê go bira hecî Emê Gozê bû me digo ewa hogê benê berîya...
Û mêrê rojê tengîya ewa gul û dîsanê penehûtê serê çîya...
Û de vava dengê tivinga wî nayê kû wilo bê bi emrê Xwudê Teala miriya...

Lê lî belê eskerê mûsika, welîya, neqîba, guldira, dela û şêxa..
Û ramayê jêrî ramayê jorî walîye Sêrtê. miserifê Belîsê. Qaymaqamê Zoqê...
Û kurê Elîyê Yûnis axayê xombamê mala Xelîlê Silêman va xwe didê ber avê

Lê lî belê ev mihûmeta giran carekî rabû ser piya...
Û hemî eskerê welatê jorîya hemî rabûne ji kozik û ji va tabîya
Û go bira pêjna Emê Gozê nayê kû wilo bê bi emrê Xwudê miriya...
Û belê hecî Hesenê Osman mi digo wez bi hogê devê gelîya Ez mêrê hezar mêrê gurê roja tengîya...
Û wala bira ser Hesenê Osman qesra baxemsê hicûm borîsiya lo lo...

Û wala bira ser qesra baxemsê ser Hesenê Osman hicûm borîsiya...
Û hecî Hesenê Osman ne zilamekî di îhtiyara dinya dîtîya...
Û zanîbû bi tûr û mi go mesela vê meselê çîya...
Û de bi çeplê zarok û çolix û çucixê xwe girtiya ti nebê berî sê rojê temame bi reva Xudê ji Qesra baxemsê revîya...
Û ev eskerê bi mihûmata giran weke pelçimê dar û devîya...
Û hawîrdorê qesra baxemsê va girtiya...
Û ev cendirmê dora Sêrtê, Kurtalan, Batmanê, dora Baykan

Û dikevîne qesra baxemsê ji aqlê cendirma were ku qesra baxemsê ji goştê xeloka ji hungivî ji hêkê Şamîya...

Lê lî belê ji bal û tavê a tijîya

Û wextê ku dikevîna qesra baxemsê de çawa sîrê sîrê sîsir û tupişk û mişka...

De situwê bavê cendirma bi bist û çar ceha şikandîya lo lo....

Lê vayê ...Lê vayê ...De le vayê....

De gelî peyayê mala bavê... yê mino lê bidin vê sebekê şev girana.. lo lawo..

Wek ku hat gotin, ev buyera Bişarê Çeto ye ku di nav çanda devkî de heta roja me hatiye. Çanda devkî li gorî ku me di gelek cihan de jî destnîşan kir, behtir di hafiza gel de bi qewet, jêhatîbun û mêrantiyê de cî digrê, wexta ku em li jiyana gelên li dinyayê dinerin ji Balkan a heta Yunan a yan jî rojhilata navîn bi hûrgilî çanda me kurda bi vî awayî te naskirin.

Dîrok jî bi zêdebun alîkariya şoreşvana dikê çima wexte ku mirovek di halu wextê xwe de bê kes behsa wî nakê û jiyana wî tê û diçê, hayê kesî jî jê nîne lê wexta ku mirov li himberî zordestiyê rabubê û mirovên bindest û dibin zîlm û zora axa an ji bega mabin, behtir gel pêwîstekê ji miroven mêr dike û hafiza meni gel jî her demê di nava dîrokê de li van mirovên wilo digrê.

“Çanda devkî hafiza çandî ji bona pêşerojê barekî pir giring digirê, ew tiştê ku di bin mejîde maye wek ku Freud jî dibêjê derdixê holê û mêjî nujen dike, ji bona pêş hafizakê nu vedikê û her wextî demê dubare dike” (Aslan 2014:12).

Bişarê çeto wek ku mirê ribabê Mirado jî anî ser ziman, şêrekî şêraye û bêhtir di hafiza gel de bi mêrantiya xwe û bi camêrtiya ku dinav gelê Tur abîdin û welatê Serhedê tê naskirin.

Wexta ku em behsa Mala Çeto dikin û dengbej û mitirb taybetiye wan dibejin behtir mala wan bi serhildana birayen wi Cemilê Çeto û ku serî li ber dewleta osmanî ya herî dawî a 1920 de danî û serhildan kir. Ji bo serxwebuna kurda şer kir, dîsa dîrok dubare kir û eşîrin destê wî ne girtin û ew û pênc qurê xwe teslim bun, lê ew û her penç qurê wî îdam kirin, ez îca kuştina wan ji kalikê xwe bê min çilo bihîstiye ezê binivîsim, Wek çirokê ji min re hatiyê gotin û her dem wexta ku bindestiya kurda te bîramin ez vê meselê û strana wê dibêjim ji xwere.

Heyla lo suwaro heylo lo suwaro

Heyla lo suwaro heylo lo suwaro

Heyla lo biraooo...

Go qeçike heyrane kurbane por küree...

Kesekî xwedanî xera di ribabata mala bave mede nemayeee....

Nalena dile bave firmand axayî

Nusredîn tu zavaye se rojayî

Fehîm tu gula xortayî

Feremez tu axayî

Belê buka ser xêlî

Çaldara bavê Feremez barkirin

Li welate Konyayê nema di bave firmand nemayi (Derwêş 1993).

Serokê herema heverkan Xeci Derwêş di got wextê ku mûfreza dewlete hat ku zarokê Cemile Çeto bibê, ji xwe Bişar hatibu kuştin, hemu dane hev û gotin bera zarokek bi mere werê ku hespê we vegezinê (wan nizanîbu ku riya wan a kuştinêye) esker zanîbu ku wê wan bikujin, ji bo wilo digot ka bera yek were hespa vegezinê we qelîkê Feremez got bera Fehim werê ew jî birayê meye serleşkerê mufrezê got ew jî birayê weye naxwe bera ew jî werê û ew jî birin û kuştin.

Ev buyer gelekî trajîke û di strana de dengbêj tavêjin ser vê buyere û dibêjin Fehim tu gula xortayî û bi vê wateyê di hafîza me de cî girtine. Her çar birayê ku birine kuştinê.

Bişarê Çeto wek ku li gelek heremen dîn jî em mînaka dibînin, her dem li hemberî zordestiyê û zilm û zorê serî hildida û di hafîza gel de bi mêrantiya xwe û her çikas îro di mêjiyê me de nexweşik bê dîtin jî ji alîyekî ve jî bi rolekî ku ji dewlemenda bistîne û bidê bindesta, ev taybetî li herema karadenîzê bê li nav efeyen Denizlî bê û herwiha li gelek herema di mejîyê gel de şoreşekî pêwîst temsil dike.

BEŞA ÇAREMÎN

ENCAM

Bi rasti encama rengvedana dîrokê bi sere xwe mijareke giringe çima ji ber ku dîrok nasekinê ji wextê ku ez niha vê nivîsê dinivîsim û bi paşde her deqê ji mere li paş dimine.

Wexta ku me bi dest vê xebatê kir armanca me li gorî hafiza gel gelo dîrok çawa xwe hefz dikê û çawa çarçoveya xweyî pêşketinê dikê û bi çi awayî vê rengvedanê dikê û mirova li pey xwe dişopîne û ev yek di stranan de, bi taybetî jî di yên Miradê Kinê de, çawa hatiye teswîrkirin. Her weha hinekî jî em li ser çanda devkî, veguhezêrên wê û hafizeya civakî jî sekinin.

Di dengbejîyê de mirovên ku vî karî pêk tînin divê hafizak wanî pir dewlemend hebê ji ber ku karê mero hemu bi mejîyê mero û zimanê mero ve giredayîye û mirovên ku pîrbêj bê divê diyalektîk a di nava mejî û ziman de pir xurt bê yana bi sernakevê û di nav gel de namdar nabe.

Herema Tur abîdin balkeşa min kîşan, di vî warî de ji ber ku herema me gelekî kozmopolît ê û gele me gelek gelê cûda di nav xwede bi cî kirine, bi vê mabestê tîkiliya gel û rengvedana ku li ser dîrokê di hafiza me de çawa cî girtiye min xwest ve binîrxîne. Liv ê herêmê mitirbî wek dengbejîyê di nav civakê de cih girtiye û hafizeya civakî, dîroka nêzîk biriya wan gihaştîye roja me.

Ji bo xebatê me sê stran an jî şerên ku Miradê Kinê dibêje hîlbijartibu û di her sê mînanan de jî me dît ku buyerên dîrokî bi awayekî di nav çanda devkî bi riya veguhezêrên çanda devkî heta îro hatine û mirov ji bo dîroka nêzîk ya herêmê dikare ji wan stranan dikare sûd wergerê.

ÇAVKANÎ

AKSAN, Ziver(2013). Miradê Kinê ve Dengbêjlik, Projeya Mastira Bêtez ya Zaningeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê, Beşa Çand û Zimanê Kurdî

ARSLAN, Mustafa (2004). “Sözlü Tarih Ve Kültürel Bellek Aktarımı “Efe Hikayeleri”, Acta Turcica, Yıl. VI, Sayı. 2. www.actaturcica.com

ASSMANN, Jann (2015). Kültürel Bellek, (wer. Ayrıntı yayınları: İstanbul

CIBO, Nezîrê (2010). Heverkan sultanları -1, Komal yayınları: İstanbul

ERHAT, Azra (2006)Yaşar Kemal’le Söyleşi, Sevgi Yönetimi, Düşünce dizisi: İstanbul

KESKİN, Necat (2006). Mardin Ve Çevresinde Bir Anlatım Biçimi Olarak Mıtrıplık Hacettepe Üniversitesi: Ankara (Teza Mastirê ya neçapkirî).

MUTLU, Erol (1996): Kürt Müziği Üzerine/ Kürt Müziği, Avesta Yayınları: İstanbul

ONG, Walter J. (2013).(Sözlü kültür ve hafıza)Metis yayınları: İstanbul

Hevpeyvîn:

XACO, Şekip (2007), Li herema rojava bapire Mala Xaco, Qamişlo.

DERWÊŞ, Xecî (1993), Bapîrê eşîrekê seyidan ya Elîkiyan, Nusaybin

T.C.
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

**MIRADÊ KİNÊ’NİN ŞARKILARINDA YAKIN
TARİHİN YANSIMASI**

ŞEYHMUS ÇETİN

15721089

DANIŞMAN

Yrd. Doç.Dr Necat KESKİN

Mardin 2016